

Hînbûna Zimanê Almanî

Temrîna ziman, hînbûna
nirxan û nasyarkirin
Babet û temrînên online
jibo xwe-hînbûnê



www.integrationsfonds.at
www.sprachportal.at


Xwe-hînbûna Zimanê Almanî

Hînbûna zimanê almanî yek ji pêşmercên serketinê jibo sazûna serketî digel civakê ye.

Ji billî beşdariya çalak di kursên hînbûna zimanê Almanî da, bernameyên kesane jibo fêrbûna ziman ji dê roleke girîng di serketina di warê hînbûnê da hebe. Ji ber vê yekê, "Binkeya Sazbûn digel Civakê ya Otrîşê" (Austrian Integration Fund) derfeta bidestxistina babetên fêrkariyê yê cûrbecûr jibo temrîna ziman û ispartekên online jibo hînbûna dilxwazî anku xwe-hînbûna zimanê Almanî ji billî wê yekê, hin babet û materiyal jibo amadetiya bona ezmûnê, li malpera xwe ya bi navnîşana www.sprachportal.at dabîn kiriye.

www.sprachportal.at: temrîna online a bêpere

Babetên heyî û li ber dest	Ast	Pisportî
Kilîpên balkêş (hînbûna bi riya listinê) Vîdyoyên Anîmasyonê (Xêzefilm) kurt ku rewş û mewqîya rojane nîşan didin; hevrê digel temrînên online bi mewqîya dimenî.	A1-B1	Xwendin, nivîsîn, guhdarîkirin
Podkest Ev bernameyên radyoyî yê bawer pêkirî pêkhatî ji hevpeyvîna digel wan kesan in ku çîroka jiyana xwe vedibêjin; û ji billî vêya, di her yek ji van bernameyan da, temrînên online bi mijara têkildar ji hatiye danîn.	A1-B2	Guhdarîkirin
Vîdyoyên „Jiyana asayî û nîrx“ Vîdyoyên kurt derbarê axaftinên cûrbecûr û hin zanyarî li ser nîrx û mijarên nasyarkirinê bi zimanên Erebi û Farisî. Temrînên online ên têkillidanî.	A1-A2	Guhdarîkirin, xwendin, nivîsîn
wêneyên panorama yê 360° Wêneyên panorama yê danûstandinê ku bikarêner dikarin di nuqteyên cûrbecûr ên wan bigerin û pirsên wê beşê bibersivînin, guh bidin diyalogan û nivîsan bixwînin.	A1-A2	Guhdarîkirin, xwendin
Xizmetên din ên online ji Mala Weşanê ya „Cornelsen“ <ul style="list-style-type: none">• Temrînên online ku temamkerê seta pirtûkên dersî yê bîngêh ên (“Pluspunkt Deutsch”) û (“Fokus Deutsch”) ji Mala Weşanê ya „Cornelsen“ in.• Kurtefilmên têkildarî her beşekê ji seta pirtûkên dersî yê (“Pluspunkt Deutsch”) û (“Fokus Deutsch”).• Hin vîdyo jibo seta pirtûkên dersî yê (“Pluspunkt Deutsch”). Jiyan li Otrîşê.	A1-B2	Guhdarîkirin, xwendin, nivîsîn
Fêrkirina peyvan Vîdyoyên kurt û mijarî jibo temrînkirina peyvên bîngêh û sereke.	—	—



Babet û behsên çapkîrî jibo xwe-hînbûnê

Babetên heyî û li ber dest	Ast	Pisportî
----------------------------	-----	----------

Kovara Polê: Hînbûna zimanê Almanî

Ev kovar çar çaran di salê da tê weşandin û sipariş û hevparbûna têda bêpere ye û bi riya adresa www.sprachportal.at pêkan e. Her babetek bo mijareke taybet û têkildarî welatê Otrîşê hatiye terxankirin û pêkhatî ji temrînkirina peyvyan, rêzîman, xwendin û nivîsîna di astên seretayî-tir e.

A1-A2

Xwendin,
nivîsî

Babet û hîndekariyên bi mijara Otrîşê

Karneymeyên bêpere bi mijarên cûrbecûr ên têkildarî çanda Otrîşê; di astên cûrbecûr ên pisporiya zimanî da. (Ji kerema xwe bala xwe bide ser vê xalê: Jibo temrînên devkî, te yê hewcetî bi hevriyekî jibo hînbûnê hebe).

A1-C1

Xwendin,
nivîsîn,
Guhdarîkirin
(Axaftin)

Peynameya wêneyî

Peynameyeke wêneyî bi bikaranîna wêneyên rengî yê cûrbecûr, peyvên nû şirove dike. Ev peyname peyv û bêjeyên bingehîn ên bikarhatî di jiyana rojane ya Otrîşîyan da di çarçoveke mijarî dide nîşandan. (Tu dikarî vê peynameyê bi 4.99 € ji dikana internetî ya (OIF) sipariş bikî).

— —

Amadetî ji bo ezmûna Sazbûn digel Civakê

Nasyarbûna digel nîrx û rêzikên jiyana komkî, her wiha hînbûna zimanê almanî, ji pêşmerc û pêdiviyên sereke yê jiyandê li Otrîşê ne. Binyata Sazbûn digel Civakê (Entegrasyon) a Otrîşê bi palpiştiya çavkaniyê zengîn û mezîni ji babetên fêrkariyê, piştevaniya penaber û koçberan di riya hewildana jîbo bîdestxistina amadetiye bona beşdariya di ezmûna Sazbûn digel Civakê dike. Ezmûnên Şîbihandinê û setek ji pirsan têkildarî pirsên ezmûnên bawerpêkirî jîbo astên cûrbecûr ên pisportiya zimên li ber dest in.

Materiyalên fêrkariyê jîbo xwe-amadekirina jîbo ezmûnê

Babetên heyî û li ber dest	Ast	Pisportî
Ezmûnên Şîbihandina Online Şîbihandina Online a beşa nivîskî ya formatê ên jêrê jîezmûna ziman a Binyata Sazbûn digel Civakê (Entegrasyon) a Otrîşê: A1-FFÖ, ÖIF-A2, DTÖ, ÖIF-B2 û ezmûnên Sazbûn digel Civakê (Entegrasyon) yê A1-B1. Encamên ezmûnê dê bîlez jîbo te bê nîşandan.	A1-B2	Xwendin, Guhdarîkirin
Ezmûnên nimûne û ezmûnên modelê Ezmûnên nimûne û ezmûnên model tam weke ezmûnên rasteqîn in û bi awayê bêpere bi riya adresa www.sprachportal.at jîbo daxistinê li ber dest in. Ezmûna modelê plêkhatî ji hin mînakên jîbo temrîna nivîsin û beşa devkî ya ezmûnê ne. Ji kerema xwe bala xwe bide ser vê yekê: Di vê ezmûnê da, hewcetî bi hevriyêkî hînbûnê an kesane ku beşa nivîskî sererast bike heyê.	A1-B2	Xwendin, Guhdarîkirin, axaftin, nivîsin
Lîsteya pirsên têkildarî zanista xwendekar derbarê nîrx û mijarên nasyarkirinê Ji vê seta pirsan pêkhatî ji pirsên ezmûnên bawerpêkirî ne û jîbo bîdestxistina amadetiye bona bersivdana bo pirsên têkildarî nîrx û mijarên nasyarkirinê di ezmûna Sazbûn digel Civakê ya A1-B1 da bi kar tên.	A1-B1	—
Peyvnameya taybet a pirsên têkildarî nîrx û nasyarkirin Ev peyvname bêjeyên dijwar an xwecihiyên Otrîşê derbarê pirsên têkildarî nîrx û mijarên nasyarkirinê bi 49 zimanan raber dike.	A1-B1	—
App'a ser Jîrefonê Navê App'ê: "Meine Integration in Österreich" Ev bernameya „Binkeya Sazbûn digel Civakê ya Otrîşê" jîbo fêrxwazên ziman di astên cûrbecûr ên hînbûna zimên da, hin lêzanînan li bara nîrxên civakî raber dike û piştî wan di riya bîdestxistina amadetiye bona beşdariya di ezmûna Sazbûn digel Civakê (Entegrasyon) digire.	A1-B1	—

Em kîjan kursên fêrkirina Zimanê Almanî bibijêrin?

Heke kursên fêrkirina Zimanê Almanî meraq dikî, ji kerema xwe digel yek ji ofîsên Binkeya Sazbûn digel Civakê ya Otrîşê ku di dewamê da hatine rêzkirin bikeve têkiliyê û bi wan ra bişêwîre:

Integrationszentrum Wien

Landstraßer Hauptstraße 26
1030 Wien
+43 1/715 10 51
wien@integrationsfonds.at

Integrationszentrum Tirol

Lieberstraße 3
6020 Innsbruck
+43 512/56 17 71
tirol@integrationsfonds.at

Integrationszentrum Oberösterreich

Weingartshofstraße 25
4020 Linz
+43 732/78 70 43
oberoesterreich@integrationsfonds.at

Integrationszentrum Niederösterreich

Kugelgasse 8
3100 St. Pölten
+43 2742/265 27-480
niederoesterreich@integrationsfonds.at

Integrationszentrum Salzburg

Inge-Morath-Platz 18
5020 Salzburg
+43 662/87 68 74
salzburg@integrationsfonds.at

Integrationszentrum Burgenland

Thomas Edison Straße 2; Bauteil 2/
1. Obergeschoss
7000 Eisenstadt
+43 2682/653 29-420
burgenland@integrationsfonds.at

Integrationszentrum Steiermark

Reitschulgasse 19
8010 Graz
+43 316/84 17 20
steiermark@integrationsfonds.at

Integrationszentrum Vorarlberg

Bahnhofstraße 10
6900 Bregenz
+43 5574/434 87
vorarlberg@integrationsfonds.at


Integrationszentrum Kärnten

10. Oktoberstraße 15
9020 Klagenfurt
+43 463/50 37 81
kaernten@integrationsfonds.at

www.integrationsfonds.at

www.sprachportal.at

Hînbûna bibandor a zimanê Almanî li malê û di seferê da



Portala online a **www.sprachportal.at** bi awayê şev û rojî jibo raberkirina xizmetên fêrkirina zimanê Almanî bi awayê bêpere amade ye. Hejamreke zêde ya temrîn, vîdyo û Podkêst jî bi awayê bêpere li ber destê te ne û tu ji her derê, heta bi Jîrefona xwe (Telefona destan) dikarî wan bi dest bixî. Aniha biceribîne û zimanê Almanî hîn bibe!

www.sprachportal.at | Hejmara têkilliya taybet: +43 (1) 715 10 51-250

Xizmetên Binyata Sazbûna digel Civakê ya Otrîşê bi hevkarîya Enstîtuya Otrîşê û Serokwezîrê Federal ê Otrîşê